Birîna Dêrsimê

Dêrsim hîn ji zaroktiya xwe ve dinaliya û di ser birînên xwe de hewar dikir
Ew bihuşta ku lorîkên dayîkan kûr kûr di guhê kevir û zinaran de xwe berdidan geliyan. Jiber ku dayîkên Dêrsimê di zagona berxwedanê de xala girînê qedexe kiribûn û bi lorikan birînên xwe kew dikirin.

Wê rojê xewa mirinê ketibû çavê mirovahiyê û zûrîna guran hemû şax û rehên wê orkestraya lorikan birrîbûn û li ser maseyên vexwarinê qedeh li hev dixistin, wesiyeta bav û kalên xwe bicîh dianîn.

Wê rojê zarokan lorik nedibîhîstin û tenê guhê wan li benda dengek bû ji bêdengîyê. Zarokên dêlegurê perwerdeya komkujîyê didîtin û bi hevûdû re ketibûn pêşbirkê û nîşanên serkevtinê ji kevtarên pîr digirtin.

Wê rojê di şikevtan de parcekirina laşan, li gund û bajaran şewitandina bedenên ciwanan, kal û pîran, hemû cûreyên hovîtiyê di mazata vê hovîtiyê de dihat pêşandan û li rê û dirban seriyên jêkirî bi coşek mezin ji generalên tirsonek re dihat diyarîkirin.

Wê rojê ji aliyê keça ku sêwîxaneyê de hatibû asimilekirin ve kevir, dar û ber hemû lawirên wê parçeya welatê min bi balafirên şer hatibû bombebarankirin û hîn û hîn jî di ser birînên xwe de dinalin.

Wê rojê Kurdayetî weke hercar dîsa bi komkujîyê re rûbirû mabû. Xwînmijên wek Yavuz, Musolinî û Hitler bi bavê xwe ve G.. xwaribûn li hember vê bêbaviyê.

Wê rojê birîna Qocgîriyê kûr bûbû. Elîsêr zava, Zerife bûk bû, di rêya evînek bêdawî de li ezmanên herî bilind asê bûn, hîn û hîn jî li govenda me temaşe dikin.

Wê rojê kec û bûkên dest bi henne navên xwe kiribûn Besê û xwe bi zinaran ve werdikirin û bi bênamûsiya teresbavan henekên xwe dikirin û di dilê bi hezaran Besêyan de cîh digirtin.

Wê rojê kesî pênc qurişên xwe di sêpêyan nedida û di dilê celadan de tirs û xof diçandin û ji Dêrsimê ta Enqereyê tifê rûyê bebextan dikirin.

Wê rojê tovê Kurdên ku îro berxwe didin bi hêsirên dayîkan hatibû çandin û ji wê rojê şûnve jî digel hemû astengiyan şax diavêje hemû deverê welatê min û bêhna kulîlkan digîhînin hemû deverên Cîhanê.

Ger ez bizanibim rojek ji rojan ev dijminê hov ji dil û can bi min re bimizice ezê ji kennan biteqim û weha bêjim: Mala derewînan xirav be. Jiber ku ne mimkune ku çêjikên guran ji gotina bavên xwe derkevin û bi berxan re hevaltiyê bikin, bê hîlebazî.

Di van rojên dawî de li ser gotina parlementerê CHP ê Onur Oymen gelek nîqaş hatin kirin û hin xwepêşandanên nerazîbûnê li hember axavtina wî ya ku di parlementoyê de gotibû: ´´**Ma ji bo dayîk negirîn me di serhildanên Kurdan de yên wek Dêrsimê de projeyên bi xwestekên wan amade bikira, wê demê li Dêrsimê çi pêwîst bû ew hatkirin.**`` çê bûn. Onur Oymen piştî çend rojan li ser daxwiyaniya Kemal Kilicdaroglu ya, divê Oymen ji CHP yê istifa bike, Oymen jî di şuna ku lêborinê bixwaze de gotibû ´´**rêvebirên me yên wê demê (Atatirk û hevalên xwe) wisa di cih de dîbûn û ev bûyer pêkanîn. Em jî li pey şopa wan dimeşin.** Derket holê ku Oymen û Deniz Baykal guhê Kilicdaroglu kisandine û gotine lingê xwe bi qasê cila bav û kalê xwe dirêj bike. Ger wisa nebe emê te ji dayîkbûna te poşman bikin. Jiber vê yekê Kiliçdaroglu ket rêya Ewropayê û xwest ku kela Kurdên daxîne û carek din ji vê seferê sûdê werbigire. Lê derketina wî ya seferê pere nake û wê dîsa bibe Kiliçdarogluyê berê.

Lê rastî ew e ku Oymen çêjikê guran e ku tenê diranên xwe qîc kir. Bi baweriya min Oymen Kurê bavê xwe ye û raste rast nasnameya xwe ya berê kivşkirî daye xwiyan. Di heman demê de CHP jî partiyek wisa ye ku bi dehhezaran Onur Oymen tê de sîyasetê dikin û dixwazin di postê berxê de kevtariyên xwe veşêrin û wesyetên bav û kalên xwe bicîh bînin. Ji berê de kum ketiye û keçelî xwiya ye. Lê ji ber hin sedemên şaş gelek Kurdên me yên Elewî nedixwestin vê serê keçel bibînin û hevaltiya keçelan dikirin. Gotinek kurdî heye ku dibêjin ´´Kûçik kûçik e çi res çi sipî``

Spas ji dijminên Kurdan yên weke Onur Oymen re ku ji yê weke Kilicdaroglu re dibêje : ´´Serî şe ye dox maşe ye kero bê dîk`` gelo ev çi ye.

Cemal Ballikaya
Cemalballikaya@yahoo.de